Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

# Bihêle em rê nîşanî te bidin

## Xizmetên Şêwirînê jibo koçberan

KURMANDSCHI



Integration

JUGEND
MIGRATIONS
DIENSTE

MBE
Migrationsberatung
für erwachsene Zuwanderer



# Xizmetên belaş ên şêwirîna kesane jibo koçberan bi kar bîne:

## Şêwirîna Koçberiyê jibo mezinan (MBE) û xizmetên Koçberiya Xortan (JMD)

### Şêwirîna kesane alîkariya te dike

Di destpêka hatina bo Almanyayê gelek babet dê jibo te ecêb û nenaskirî bin. Heta heke heyameke dirêj li Almanyayê bijî, renge hin pirs hebin ku li dû bersiva wan bî.

Loma şêwirîn û piştgiirya kesane ku jibo alîkariya bio te pêk hatiye, dê alîkariya te bike. Hema bêje jibo hemî mewqiyên jiyana rojane, alîkarî û piştgiriya kesane raber dike. Bi vê riyê tu yê fêr bibî ku karên xwe bigirî destê xwe û biryarine serbixwe bidî.



## Xizmetên Şêwirînê jibo koçberên ciwan û mezin

Xizmetên Şêwirîna Koçberiyê jibo mezinan, koçberên mezin ên zêdetir ji 27 salî piştgiriyê dike.

Xizmtên Şêrîîna koçberên ciwan, pişta xortên bi raboriya koçberiyê navbera 12 heta 27 salî dike.

Di rastiyê da tu dikarî digel xizmetên şêwirîna Koçberiyê jibo koçberên mezin û Xizmetên Koçberên ciwan bikevî têkiliyê. Piştî civîna yekem qonaxên din jibo te ji aliyê rêxistinên Şêwirînê dê werin diyarkirin. Û rewşa te ya kesane û endamên malbata te dê were berçavgirtin.

## Derfetên baçtir bi riya Şêwirîna kesane

Karmendên navenda Şêwirînê bi giştî zimanê welatê te têdigihêjin. Ewna her iwha şêwazên fikrî û tevgera civakî, mezhebî pû çandî ya têkildarî te nas dikin. Ewna hevrê digel te planekê amade dikin ku tu dikarî pêngavên seretayî yên jiyana li Almanyayê nas bikî. Lêhûrbûna Şêwirînê li ser pisportî û zanista te ya kesane ye. Tu yê fam bikî ku kîjan pêşniyar jibo mayîna li Almanyayê jibo te hêsantir e.

Di van xizmetên Şêwirînê da tu dikarî hemî mijarên jiyana rojane hilêxînî, wek mînak:

- Pirsên hiqûqî derbarê mayîn
- Hînbûna Zimanê Almanî (Wek mînak bi rêya beşdariya di kursa Entegrasiyonê da)
- Hînbûna li dibistanê, Perwerdehiya karî (wek mînak qonaxên çûyîna bo dibistanê, riyên perwerdehiyê, pêderxistina hêjatiya pîşeyî)
- Karkirin (wek mînak amadekirina daxwaza kar, Lêgerîna li cihê kar)
- rewşa aborî (wek mînak derhat, kiredî, deyn)
- Mayîn û îqamet (wek mînak Lêgerîna li cihê mayînê, dabînkirina debara jiyanê)
- Tendurustî (wek mînak sîgortaya dermanî, Lêmiqatebûnên Bijîşkiyê)
- rewşa tendurustiya kesane (wek mînak pirsgirêkên tendurustiyê)
- Zewac, Malbat û Terbiyetkirin (wek mînak Ducanîbûn)
- Ajovanî û hatûçûn (wek mînak Bawernameya ajovaniyê, hatûçûna gelemperî)
- Bêhnvedan, werziş û demên betlaniyê (wek mînak pêşniyarên demên betlaniyê, endamtî li klûban)
- Çalakiyên rojane (wek mînak kirîn, têkilkiya digel rayedaran)

## Pêşniyarên taybet ên Xizmetên Koçberiya Ciwanan, jibo xortên bi raboriya Koçberiyê

Jibo xortan, yekem amadebûna wan li welatekî biyanî bi heyecan e, lê dijwar jî nîne. Li dibistanê, li perwerdehiyê û li cihê kar û dema danîna têkiliya nû ya civakî, ewna divê digel çelinc û konflîktên nû tevbigerin. Xizmetên Koçberiya Ciwanan, şêwirîna kesane, piştgiriya berfireh û pêşniyarên komî yên guncan li gorî pirsgirêk û pirsên te yên taybet raberî te dike.

Û tê da tu yê pêşniyarine din ji wan di babetên jêrê da werbigirî:

- Dibistan û Pergala Perwerdehiyê
- Hînkirina kesane û plandarêjtina kaarî (bi hevkariya ajansên peydakirina kar ên xwecihî)
- Beşdarî di hemî warên jiyana civakî, çandî û siyasî
- Têkildarî medyayên nû, nemaze bernameyên hînbûna zimanê almanî



## Şêwirîna serxet

Ji bilî Şêwirîna kesane, di du bernameyan da, îmkana şêwirîna serxet raberî te dikin. Şêwirîna serxet a „mbeon“ û portala Şêwirînê ya jmd4you alîkariya ta dikin ku bersiva pirsên xwe di demeke kurt da werbigirî!

Biriya „mbeon“, tu dê rênîşandan û piştgiriya kesane di çarçova Chat'ê da werbigirî û tu yê bikarî şev û rojê pirsên xwe bipirsî. Şêwirîn bi riya bernameya „mbeon“ tê raberkirin û bi zimanên cûrbecûr li ber dest e. Li „mbeon“ tu dê hin şêwirmendan peyda bikî ku bi zimanê te diaxivin û ji bo te li wir in.

- *www.mbeon.de*

Jibo koçberên ciwan heta temenê 27 salî, şêwirîna serxet (online) pêkan e. Tu dikarî pirsan gelek ron û zelal bi riya Chat'ê an bi awayê kesane bipirsî. Bersivdan dê ji aliyê kedkarên bi ezmûn ên JMD'yê pêk were.

- Amanî *www.jmd4you.de*, her wiha
- Inglîzî *www.your-way-in-germany.org*
- Rûsî *www.putjwgermaniju.org*
- Tirkî *www.almanyayolu.org*
- Erebî *www.bousaletuk-fi-almanya.org*
- Albanyayî *www.udherrefyesi-gjermani.org*

Tu dikarî hertim derbarê endamên malbatê, dost,m hevklar, hevpol, hevmal an endamên klûba xwe ya sporê, şêwirînê werbigirî.

Lêzanînên zêdetir werbigirî û pêşniyarên bêpere bi kar bînî!

## Tu ji ku dikarî lêzanînên zêdetir derbarê xizmetên Şêwirînê werbigirî?

Tu dikarî xizmetên şêwirînê yên taywebt derbarê navendên jêrê li navçeya xwe werbigirî

- Ofîsên Rêveberiya xwecihî, rêveberiya bajarîan navçeyî (Gemeinde-, Stadt- oder Kreisverwaltungen)
- Civatên navendî yên rihetiyê yên serbixwe (Civata Rihetiya Karkeran (Arbeiterwohlfahrt), Civata Karîtas a Almanyayê (Deutscher Caritasverband), Rêxistina Protestan a Diyakoniyê û Geşatiya Almanyayê (Diakonie Deutschland-Evangelisches Werk für Diakonie und Entwicklung), Xaça sor a Almanyayê (Deutsches Rotes Kreuz), Civata rihetî û beranberiyê ya Almanyayê (Deutscher Paritätischer Wohlfahrtsverband), Ofîsa navendî ya Rihetiya Cihûyan li Almanyayê (Zentralwohlfahrtsstelle der Juden in Deutschland))
- Civata awareyan (Bund der Vertriebenen)
- Civata Navneteweyî (Internationaler Bund)
- Rêxistinên ku berpirsê çalakiyên civakî yên xortan in (Träger der Jugendsozialarbeit)
- Lidarxînerên kursên Entegrasiyonê (Träger der Integrationskurse)

## Tu dikarî lêzanînan li nav Înternetê bi riya:

- *www.bamf.de/DE/Themen/Integration/ZugewanderteTeilnehmende/BeratungErwachsene/beratung-erwachsene-node.html*
- *www.mbeon.de* û
- *www.facebook.com/mbeon.chat*
- *www.jugendmigrationsdienste.de*

## Derbarê weşan

**Weşanvan:**
Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
90461 Nürnberg

**Dema raberkirinê:**
10 / 2020

**Çap:**
Silber Druck oHG, Lohfelden

**Amadekirî li:**
MediaCompany – Agentur für Kommunikation GmbH

**Dîmenê bawerpêkirî:**
istock / sturti, istock / lisegagne, istock / SDI Productions,
BAMF / Bildkraftwerk / Thomas Geiger

**Derfeta siparişkirinê:**
Publikationsstelle des Bundesamtes für Migration und Flüchtlinge
www.bamf.de / publikationen

Herwisa hûn dikarin vê weşanê wekî belgeyek PDF-ê ya gihîştbar li ser vê malperê daxin: www.bamf.de / publikationen

Ev kovar ji aliyê Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberiyê va wek beşeka xizmetên gelemperî tê weşandin. Weşandin bi awayê belaş pêk tê û jibo firotinê nehatiye berçavgirtin.

Seredana me bike
www.facebook.com/bamf.socialmedia
@BAMF_Dialog
www.bamf.de

Other Language
www.bamf.de/publikationen